SÎMOR

Nexweşxaneya tirkî ya hemû musilmanan

Luqman Asîhî

Min wisa hizir dikir ku dema yek diçe wê derê tenê Xwedê û pêxember li bîra wî dimînin, ez bi xwe wisa bûm. Tenê min ji xwe re nimêj û taetê Xwedê dikir û çi tiştên din li fikra min nebûn. Ji dergehê (heremê) û wêde, wan nexweşxaneyek mezin û modêrn durist kiribûn û bi zimanê xwe û bi zimanê erebî jî li ser nivîsandibûn: "Ev nexweşxane ji hemû muslmanan re ye". Caran dema ez bi hevalên xwe yên kurd re li hember dergehê wê re derbaz dibûm û çavên me bi wê nivîsandina kesk diket kêfa me jî gelek dihat û me digote hevdu: "*Van karekî pir baş kiriye...*" Em jî muslman heger carekê Xwedê nekir yek ji me nexweş bikeve ew wê me çare bikin. Ez dirêj nakim şeva beriya cejnê hevjîna min nexweş ket em tev lê êwirîn û cilên ku ji Kurdistanê bi xwe re anîbûn me li berkirin û bi çi halê heyî me nexweşa xwe gehande devê nexweşxaneya hemû "**musilmanan**". Bi lezî du birînpêçên jin ber bi me ve hatin û nexweşa me ji nav destên me anîn der û ber bi hundir birin û bi zimanekî erebî yê bê ser û ber yekî ji me re got: "*Hûn serçavan hatin ey mêvanên mala Xwedê*". Cilên ku li Kurdistanê me li ber xwe kiribûn, zelaman her yekî alayeka Kurdistanê ya biçûk bi sîngê wî ve bû ango baş xuya nedikir, lê yên jinan her yekê alayeka mezin bi pişta kirasê wê ve bestibûn ku her ji dûr ve xuya dikir. Lê li vê derê ger ez ya rast bibêjim hîngê ji hevjîna min zêdetir çi kesên din û çi tiştên din li bîra min nebûn û ez di wan hizran de bûm ku ne ku dayika zarokên min di nava destên min de bimire û ez dûr!... Di wan xeyalên xirab de bûm min dît du birînpêçên reng esker destên nexweşa me girtine û wê bi lezûbez ber bi me ve dihajon! Nêzîkî me bûn û bi zimanê xwe û bi dijwarî û dûr ji hemû pirinsîpên rêzlênanê gotin: "*De zû çi kes ji we di hundirê vê derê de nemîne, bila dewlet û ala we, nexweşa we çare bike!*" Dema min ji hevjîna xwe pirsî, ka sebeba vê hemû yekê çibû. Got: "*Gava çavê wan bi wê alayê ket ku li ser pişta min hatiye duristkirin, ji min pirsîn tu ji bakûrê Îraqê yî tu kurdî û ciyê we û ala we li vê derê nîne zû bi zû biçe derê.*"

Li derveyî nexweşxaneya hemû muslmanan -ji bilî kurdan-, min ji pîrek û hevalên xwe re got: "*Tirk ne weka çi kesane her tiştê wî di çarçoveyê hizra wî de dilive û tenê pêvajoya dîrokê dikare keviran ji ciyên wan biherikîne.... De zûbin da em dermanekî ji nexweşa xwe re peyda bikin...*"